

Daxuyaniya Komela Gelên di bin gefê de

Göttingen, 24.04. 2007

Terorîstên îslamîst 24 kesên Êzidî kuştin

Serokatiya Îraqê mecbûr e Êzidiyan baştir biparêze.

Piştî kuştina 24 kesên Êzidî li bajarê Musilê bi renekî hovane, Rêxistina Gelên dibin gefê de (GfbV) roja Sêşemê nameyek lezgîn arastey Serokatiya Îraqê li Baxdayê û Hukumeta Herêma Kurdistanê kir û ji wan daxwaz kir ku Êzidiyên bajarê Mûsilê û herêma Şingalê baştir biparêze.

Tê gotin ku rewşa asayîşê li Herêma Şingalê dê zûtir û baştir ber bi hêminiyê ve bice, eger ev Dever tevli herêma Kurdistanê bibe.

Derbarey vê mijarê gerek e di zûtirîn wext de dengdanek bête kirin.

Weke tê zanîn li Çiyayê Şingalê nêzîkî 400 000 Kurdên Êzidiyên dijîn, behra bihtir ji Êzidiyên Cîhanê li vê deverê nişteci dibin.

Rê û rêbarî li vê Deverê hatin girtin, bi tenê rêyek yan cadeyek maya, ew cada jî gelekî bivek e.

Xebatkarên Şaxê „GfbV“ li Herêma Kurdistana Îraqê roja sêşemê ragehandin me ku Terorîstên îslamîst li bajarê Musilê otubusek bi darê zorê rawestandin; di vê otubusê de xebatkarên Êzidî hebûn, Ji ciyê karê xwe ve „Karxaneyekê Cilan“ ber bi malên xwe ve diçûn. Terorîstan piştî ku otubus rawestandin, hemî xebatkarên Êzidî jê derxistin û ew kuştin. Di heman rojê de jî kesin nasnama wan nediyar êrîş birin ser kamîonên xwarinê ku ji Kurdistanê ber bi Şingalê ve diçûn.

Xebatkarên Şaxê „GfbV“ li Herêma Kurdistanê ragehandin ku şifêrek bi dijwarî hatiya birîndar kirin û herweha hemî xwarina di kamîonan de ji aliyê êrîşkaran ve hatiye dizîn.

Ev êrîş li nêzîkî bajarokê Al-Rabia, li ser cada yekemîn ku Kurdistanê bi Şingalê ve girêdide, encamdaya.

Hêjayî gotinê ye ku herdem li ser vê rêyê êrîş li ser kamîon û terembêlên xwarin û dermana tene kirin.

Karmendê „GfbV“ û berpirsiyarê karûbarê rojhilata navîn di „GfbV“ de, rêzdar Kemal Sîdo ragehand ku roj bi roj bihtir malbatên Êzidî ji bajarê Musilê direvin, ji ber îslamîstên tundro gefan li wan dixwin û çavsoyîyê ji wan dikin û dixwazin wan bikujin. Li gor agehdariyên „GfbV“ ji sala 2003 an ve ji kêmayî ve 20 000 malbatên Kurd (Êzidî û Misilman) ji Musilê reviyana.

Hindek agehdariyên giştî:

Tê zanîn ku Êzidî di nav Kurdên Misilman de weke xwedyê dînekî kêmhijmar têne naskirin. Êzidî yan jî Êzidiyatî ne girêdayî diyaneta Xirsitiyanî ye û ne jî girêdayî diyaneta Îslamê e; Êzidiyatî diyanetêke serbixwe ye.

Êzidî bi zaraveyê kurmançî diaxivin û li Îraqê û Sûriyayê û Tirkiyayê û Armenîstanê û Gurcistanê û herweha li dervey Welat nexazim li Europa rojava dijîn. Hijmara wan jî nêzîkî 800 000 î ye. Herêma wan ya navendî yan jî ya bingehîn li Bakûrê Îraqê ye, li vê herêmê nêzîkî 550 000 Êzidî dijîn. Li Elmaniya nêzîkî 45 000 Êzidî hene, behra bihtir ji wan wek penaber ji Tirkiyayê reviyana Elmaniya.

Hijmara Êzidiyan li Şingalê nêzîkî 400 000 î ye, anko 80% ji nişteciyên Herêma Şingalê Êzidî ne.

Rê û cadeyên di navbera bajarê Musilê û Şingalê de hemî girtî ne û gelekî bivek in, tu kes nikare tê re derbasbe. Yekemîn rêya ku hindekî durust û hêmin e, rêya di navbera Duhok û Al-Rabia de ye, lê ev Rê jî bivek e, ji ber gelek caran Terorîstên îslamîst êrişan dibin ser van rêyan û gefan li xelkê Deverê dixwin û divên wan bikujin.

Gesellschaft fuer bedrohte Voelker e.V. (GfbV)
Society for Threatened Peoples
Dr. Kamal Sido, Nahostreferat/ Desk Middle East
P. Box 2024, D-37010 Goettingen
Tel. +49/551/49906-18, Fax:+49/551/58028
E-Mail: nahost@gfbv.de, Homepage:<http://www.gfbv.de>